



KOVARA



KOVARA KURDÎ A MIZAHÎ / HUMORISTISK KURDISK TIDNING



Mattloste

KOVARA WE JI DU MEHAN CAREKÊ DERTÊ

VARANNAN MÅNAD UTKOMMER

hejmar : 8 87

# Govend

Li Kultur Rodetê (ciyê ku alîkarî ji kovaran re dîkin) bi navên kurdaye-tyê gewendekî me ketiye govendê û serî dikşîne.


Bi xêra referensa vî gewendî kovara we ÎSOT alîkarî ji Kultur Rode- tê nestend. Lê dîsa jî felek li ru- yêñ me û we tevde keniyyaye ku ev ge- wendê me di Mala Apo de (wek asîsta- nekî) naxebite. Ji ber ku ev gewen- de bi çavnebariya xwe, wê rojê du- sê kesên bê pere ji birçîna bikuştâ- na.

Heta îro bi dalevêrên cûrecûre li Tirkîyê nehiştin ku em kovarên xwe bi Kurdî derxin. Iro jî bi referensa gewendê me ev xebata me tê xwestin ku bê fetisandin. Bi rastî em naxwa- zin gewendê me û Tirkên şowenîst tê- xin beroşekê û bi hev re bikelînin. Lê çi feyde em dikinnakin tu fer- qên mezin jî tê de nabînin.

Îro gewendê me dixwaze xwe ji me veşêre... Hewce nîne, em zûde hevdû dinasin.

Li Kurdistanê ev gewende wexta di- çû xanê li dorkeran digeriya : ker bi kerîtiya xwe jê re tehamul nedî- kir û zîtik davêtinê... Nuha li vi- rê (Swêd) gewendê me dixwaze di nav zerikan de bi şexsiyetek nuh, xwe bide naskirin. Lê çi feyde tu xwe bi heft ava jî bişoyî, tu nikarî xwe biguherînî. Tu di nav me Kurdan de çibî, tuê wusa bimînî....

Yanî wek pêşiyêñ me jî gotine "Tu



KOVARA KURDÎ A MIZAHÎ  
HUMORISTISK KURDISK TIDNING  
JOURNAL HUMORISTIQUE KURDE

ANSVARIG UTGIVARE  
OCH REDAKTÖR:

MAMOSTE

XWEDÎ BERPIRSIYAR  
Û REDAKTOR:

MAMOSTE

NAVNIŞAN / ADRESS:  
c/o Gezgin  
Axbyplan 5  
163 73 SPÅNGA/SWEDEN

BUHAYÊ WÊ / PRIS:  
10 Skr. 10 Ff, 3 DM.

ABONA SALEKİ : 70 Skr.  
PRENUMERATION: 70 Skr.  
TFN: 08/760 81 23  
POSTGIRO: 496 03 75-6  
ISSN: 0283-099X

nebuŷî mela û te lûfik di quna miriya- neda'.

Yekî ku pozê wî ji Îsotê neşewite ka wê êdî ji çi bişewite?

Gewende em dizanîn pozê te naşewite: lê herkes ne wek te ye. Ji ber vê yekê heta ji me bê, emê jiyana Îsotê bidomînin.

# Vîdo û Rasto

Vîdo : Kuro tu çi dikî? Te dest bi limêjê (nimêj) jî kiriye? Ma te destêن xwe li ber kê wusa vekirine?

Rasto : Bîsmîllah, bîsmîllah!...

Vîdo : Kuro kuro, ka tu tûj buyî ka tu xwedî hêz buyî, ka tu M.L nîst buyî?

Rasto : Elhemduîllah, elhemduîllah!...

Vîdo : Ez nuha hîn baştir fahm dikim ku ji bo çi gotine "Bijî ji bo ku tu bibînî"

Rasto : Subhanellah, subhanellah.

Vîdo : Ka tizbiya te, ka kum û Qur'ana te?

Rasto : Ku merîv di nav kurdêن me de serî hunda neke, gelo wê kî hunda bike!... Ez û

maliya xwe bi hev ketin, zarok deha nikarin bêñ oda min. Min dev ji karêñ malê berda û ji yên derve jî min avêtin. Û ne ez û ne jî heval û hogirêñ min dikarin herin ba hev û...


Vîdo : Bese, bese... Ma te xêr e, çi qewimiye?

Rasto : Ji ber xwendina pirtûk , kovar û rojnaman ez nikarim tiştekî din bikim!..

Vîdo : Ma ji bo vê yekê ye, ku te xwe wusa pîs kiriye?

Rasto : Ma qey ev hindike? Lê tu çawa dikî?

Vîdo : Ez! Ez li vîdeoya xwe dinêrim û kê bibînim rexnê xwe lê dikim...





**Hevalê hêja'**

Redaktorê kovara Îsot'ê.

Ez Kurdeki welatparêz û welatperwer, penaberekî (multecî) xizan im. Li vî welatê emperialist ev serê çend meha ne li karekî digerim, lê heyhat û çi feyde ku min hê tu karek bi dest nexistiye. Hêviya min pêşî Xwedê paşê jî tu yi.

Eger te bikarîbûna ji min re karekî peyde bikirana çiqas baş dibû. Ez ji îro pê ve li benda bersîva te me.

**Digel silavên biraderî'**

Abdilmitalib Xêrnas

Bersîv:

Kakacan! Ez ji te re çi bibêjim!

**Hevalên giranbiha!**

Ez xwe hînî xwendin û nivîsandina Kurdî dikim. Min temamê hijmarêni Îsot'ê xwendine. Ji bo xwendin û nivîsandina xwe hê jî bi pêş ve hinekî bibim li meteryalê Kurdî digerim. Min bihîst ku li Almanya'yê û Swêdê Akedemiyên Kurdî hene. Bes ez navnîşana wan nizanim ku ji wan alîkarî bixwazim.

Hûn karibin navnîşana van akedemiyan Kurdî di Îsot'ê de çapbikin, ezê baxtiyar bibim.

Di xweşiyê de bimînin.

Rasîm Nezan NORVEÇ

Bersîv:

**Nezanê hêja'**

Tu dibêjî ku "Min temamê hejmarêni Îsot'ê xwendîye". Lê ez ji te bawer nakim û wê xwendina te jî meqbûl nabînim.

Yekî ku hema du hejmar tenê jî Îsot'ê xwendibe: li du van tiştikîn nav heye, ew bi xwe tune ye nagere û serê xwe pê naêşîn e.

Lê dîsa jî ji bo te, me bi serokêvan muesesan re di telefonê de axaftinek çêkir. Lê çi feyde serokêvan muesesan bi xwe jî navnîşana muesesêن xwe nizanin.

De tu jî êdî ji nexweşiyê xelas be û di xweşiyê de bimîn e.

ISOT

Merheba Isot!

Ez li Alemania Kurtçî olmîş bûme.  
Ez işitmiş kirim kî li Swêd multeciyan qovmîş nakin.

Ez ji diya Durmîş û Apê Satilmîş  
jî mektup almîş kiriye kî ew der  
pir gozel e.

Hûn ji min re şert û şurtên multeci olmaxê yollamîş bikin, ez pir kîfxwes olmîş dibim. Eger ez gelmîş bikim Swêd, devrîmcî sozî vermîş didim kî ji ISOT'ê re jî abone olmîş dibim.

Bijî Kurt û Kurdîstan'  
Heqê me, emê soke soke almîş  
bikin!...

Gokçe Şahînoxlu ALEMANYA



Destbirakê Isot'ê,

Hevalê hunermend, Kurdnasên hêja  
kovara we Isot ket destê min.

Miletparêz zanyarê Kurd, Şekroyê  
Nado Elhedulîlayov etnografekî erhede ye. Di welatê me Hurmîstan'ê de ji malbateka pir mezin e. Nuha 40 pez, 12 qaz û 37 mirîşkên wî bi taybetî hene. Pirtûka wî ya binavê "Zîqe zîq"ê li temamê Hurmîstan'ê deng daye. Lê çi feyde hê ji çapê derneketiye ku ez yekî ji we re yadîgar bikim.

Bi silavên germî.

Tîmtîrê Xîlxîlî Mîratxirov

ÇAĞANIYOV

Endamê Nivîskarêن Yekîtiya

Hurmîfroşen Hurmîstanê.

Xwediye kovara Isot'ê!

Hevalê hêja û giranbuha û berkevtî,  
delal û ezîz û xoşewist û berêz û serfiraz û dilnerm û dilgerm û evîndar û nerm û nazîk û serkewtî.

Ez nizanim ramanêñ xwe çawa rêzkim.  
Ev karê te, yê payebilind û bi qiyemet û rûmet û bi bereket ISOT kete destê min. Ji bo me Kurdan xizmeteke bê payan hêja ye...

Bijî heta dinya hebe.

Xwendevanevêkî Isotê

ATINA



Minên Erebî,  
... main. Ev yeka han tenê rastiyek  
... kîr: Çirokê vîza xwe ji xwendevana stend, ji  
yana xwe di nav gel de dît. Piştî çar salan, Bavê Nazê Ro-  
mana xwe "Çiyayê bi xwînê avdayî" derxist. Ev roman  
bû ciyê şanaziyek mezin ji me re, ne tenê ji ber ku romana  
kurmancî ya yekemîn bû (ji der efrandinê kurdên Sov-  
yet) lê belê ji ber asêlêkirina wê ya tekûz. û her wiha ji ber  
"giringiya wê di hişiyarbûna Kurdan de"(4); ji ber ku  
"dike Kurd çalakî tekoşîna çînayetî û rêzanî ji bo bidest-  
xistina mafê mirovayettî bike"(5)

Weşandina vê romanê bi

(Ji pêşgotina pirtûka "Hêsir û Baran")

Wêşanên Jîna Nû, çapa yekem, Ilon, 1986

Bî xêra vê pêşgotinê me navê romanek kurdî  
bihîst "Çiyayê bi xwînê avdayî". Ji bo ku  
em ji xwendina vê romana dengdayî mehrum  
nemînin, cîh nema em lê geriyan. Me ne li  
Kurdistana Swêd û ne jî li welatên din vê  
romanê nedît.

Ji ber vê yekê em têde ketine şikê. Gelo  
bingeha vê romana kurdî heye an na?

KU DI GUNDÊ ME DE PIVîSKAR  
HEBUNA WÊ GIYAYÊ ME  
BI SIR AVDANA.

# pirs

Mamoste ji şagirtêن xwe pirsî:

Kî kare navê hukumeteka herî  
barbar bêje?

Kesî dengê xwe nekir.


Mamoste dîsa pirsî:

Kî ku bizane ezê wî ji sinif  
derbaskim.

Dîsa kesekî deng ji xwe der-  
nexist. Mamoste gelekî aciz bû.  
Dûra Hişko tiliya xwe rakir û  
got:

Ma em navê tenê  
bibêjin, wê yên din berxweneke-  
vin?

KOLIKI



HUVUD OCH SPÅR



# SERSAL

Kurdên me jî êdî roja ji dayikbûna xwe pîroz dikan. Ev tişt heqê wan e jî elheq. Lê belê piraniya wan hê nizanîn kengî hatine dinyê, yanî kîjan wextî ji dayîka xwe bûne.

Ji ber vê yekê nuha li Ewropayê lêkolînê pir giranbiha li ser vî tiştî amade dibin. De werin em bi hevdu re piçekî li ser van lêkolînan rawestin...



Bi rastî ez jî tarîxa xwe yî hatina dinyê nizanim. Lê min ev problem bi şeklekî gelek erzan halkir. Nuha ez û hevala xwe yî Swêdî vê rojê her sal jî pîroz dikan.

Gerek meriv praktîk be. Min tombalayek sitend û çûm malê rûniştîm. Nûmera ji navkîsikê tombalayê kişandim. Kîjan numere derketin, min wan numera wek tarîxa xwe yî hatina dinyê qebûl kir. Heta nuha jî, hê min tu xerabiyek jê nedîtiye.

Ê min, bavê min li gunda mamoste bû. Nuha 24 zarok li ser bavê min di nifûsê de qeyîtkirî ne. Lê bi rastî diya min sê zarok tenê anîne dinyê. Hûnê bêjin "çima?".

Bavê min hersal diçû nifûsê û digot: "Ji min re du (cêwî) zarok çêbûne", wan zarokan li ser xwe qeyît dikir û perê çêbûna zarokan distend. Du sê hefte têre derbas dibûn, bavê min dîsa diçû nifûsê û digot: "Rehme li dê û bavênen haziran be, herdu zarokên min jî mirin", û wê demê heqê mirina zarokan distend. Bavê min bi vî awayî ïdara xwe dikir.

Nuha ez jî di nifûsê de mirî têm xuyakirin. Lê dîsa jî, piştî ku ez derketim Ewrupayê, roja ji dayîkbûna xwe pîroz dikim. Lê bi rastî em hersê xuşk û bira jî nizanîn kengî hatine dinyê... Ji ber ku bavê min ji xwe re kîribû adet, ku hersal diçû nifûsê mirin û çêbûna zarokan nişan di da, tarîxa çêbûna me jî di nava ên ne rast de hundabûn...



Nayê bîra diya min, ku ez kengî hatime ayê. Lê bavê min dibêje ku: "Dema gayê la Hecî Çelebiyê Qurmişlû miribû, tu hayî dinyê". Nuha ez li Swêdê dijîm. Her sîroja ji dayîkbûna xwe pîroz di, ez nikarim bikim.

bo ez karibim: gerek ez tarîxa mirina iyê mala Hecî Çelebiyê Qurmişlû derxim eydanê!...


esên wê demê jiyanê, ku li ser vê buyerê lîkariyekî ji min re bikin, qenciya wan u carî ji bîr nakim.

...Ev rastiye ke, ku ez di sala xela ya mezin de hatime dinyê. Baş tê bîra min wexta ez biçûk bûm, dayîka min serê min datanî ser çoka xwe û ji min re digot: "Lawikê min, te bereket xist mala me, wexta ku tu tinebuyî li gundê me xela hebû. Di wê sala xelayê de, rojekê ber destê serê sibê dema baranek hûr dibariya tu ji min re çêbuyî." Lê tiştê ku ez pê nizanim, di kîjan meh û rojê de ez hatime dinyê. Ez nuha li ser vê yekê lê kolînekê çêdikim.

Li ba me havîna baran nayê. Ez zanim ku ez havînê çênebûme. Zivistanê jî, bi piranî baranek hûr nabare, ma di destikê min de payîz û bihar. Ji ber ku em payîzê debara xwe hildidin û li gora dayîka min digot ku "...te bereket xistiye ma la me", ez dibêjim ku ez di payîzê de hatime dinyê. Ev tiştîkî rast e û va ye li ber çava ye: İja di payîzê de kîjan meh bû, hê ez nizanim. Lê ezê lêkolîna xwe bidomînim....



# demirkrasî



Hevpeyvînek bi Carl Blînd (kor) re  
-Carl Blînd, tu ji bo çi Tirkîyê  
diparêzî?

-Destbirakê minî Regîn got ku "Kî  
hevalê me ye, dibê Tirkîyê biparê-  
ze". Ozal ji Regîn re, Regîn jî  
ji min re got ku "li Tirkîyê DE-  
MIRKRASÎ heye". Loma ez dibejim li  
Tirkîyê DEMIRKRASÎ heye û ez dipa-  
rêzim.

-Baş e, tu dixwazî DEMIRKIRASÎ ya  
li Tirkîyê heye, li Swêdê jî hebe?

-De wir de here pîsê heram, ma qey  
em jî RABRAB in!...

Yeko : Tu dizanî ji bo çi hemû  
rêxistinên (43) me Kur-  
dan her wext yekîti di-  
xwazin û qet tu carî jî  
nabin yek?

Dido : Na! Ez tiştên wusa qet  
nizanim...

Yeko : Ji bo ku ew nizanîn wê  
çawa bibin yek!



Neko : Kuro ew çi demançeye  
di destê te da?

Lêxo : Na! Na! êdî çare ne  
ma, gerek ez lêxim!




Neko : Kuro tê li kê xî?

Lêxo : Her kî ku dikare bini-  
vîsîne û çap bike!...

# Seydali GÖNEL

Di vê hejmara ISOT'ê de jî, emê karîkaturîstekî li Kurdistana Turkiyê hatiye dinyê pêşkêşî we xwendevana bikin.

SEYDALI GÖNEL di 1951'an de li Sivasê hat dinyê. Di Komela Karîkaturîstan de xebitiye. Nuha di roj-nama Cumhuriyet'ê de dixebite.



# CABIN ŞEWAQİ



## ZAROK



## û mamoste

-Ez ji mamostê xwe pir aciz bû me!...

-Çima, berxikê min?

-Çima mima tune!...

-De ka ji bavê xwe re bibêje!

-Mamostê min wexta tê ba me, tim û tim wê bêje: "Haydi çocuklar, kaxizekî derînin bîldeki mola bikin". Rojna jî dibêje: "Hûn mola dewam bikin ezê herim ba rektor", lê gava tê ba me jî, ji bîna cixarêtu kes nikare li balê rûnê...



# ÇÎROKANÎ TEYB

Sagor fron Kurdistan an jî Çîrokanî Museccelekan  
Nûser : Fersendî Çepikşeqşeman

Kaka nûsere Kurdekanman, le sayeyî cotoyar û ladêyekaman  
û her wa's be îcatbûnî teyb û museccelekan, çîrokî Kurdîman  
kopî dekan. Em karekopiyeke bo wilat û milletman zor pêwîst  
û xoş e.

Ême wekî krêkaranî ISOT zor supasî teyb û museccelekan deken,  
ke nûsere kopîkêşekanman le fîkr û mandubûnî ramanî xelas  
kirdiwe.

Her weha zor supas bo nûserî kurdman kak Fersendî Çepikşeqşeman  
ke em çîrokana tescîl kirduwe we be nawî xo bilawî kirduwe....

Komeleyî Çîroknûserekânî ISOT  
Le Derewey Wilat



## CONEGE

Serokwezîrê Tirkîyê Ozal û heyeta wî derketibûn teftîşê. Li gundekî Bîtlîsê bi gundiyan re xeber dan, rewsa wan pîrsîn û ji heyetê hinekan heta derd û kulên gundiyan li ba xwe nivîsandin. Ji ber vê yekê tirsa gundiyan piçekî şikiya. Gundiyekî camêrî kir Ozal û heyeta wî bir mala xwe.

Di hewşa mîrik de dewarêñ wî mexel hatibûn. Ozal ji bo xwe bi gundiyan hinekî din jî şêrîntir bike, ji xwediyê malê pîrsî:

-Ha ev çêleka han, rojê çend lîtir şîr dide?

Xwediyê malê got:

-Rojekê erê, rojekê na nêzîka çarpênc tasan dide....

Ozal paşka sutiyê xwe xurand, qir-

ka xwe bi belxem avêtinekê paqij kir û bi destê xwe dewarek din işaret kir û got:

-Lê ew çêleka han çend lîtir şîr dide?

Xwediyê malê bi dilekî safî got:

-Begê min ew yekî wek te ye. Em nikarin tu şîrî jê bistînin...

Ozal hêrs bû, çavêñ xweyî zexelî tewşo-mewşo kir û bi ma'dekî tîrs û tal got:

-Tu çawa xeber didî, ev ci edebsizîye?


Xwediyê malê bi tîrs domand:

-Begê min, yanî min xwest ez bêjim ku ew ne çêlek e, conege ye. Yanî ew jî wek te nêr e. Eger di vê de edebsiziyek hebe, min bibaxşîne!..

# QEHRERMAZE BE' DAW

ISOT rüpel 15





KOVARA KURDÎ A MIZAHÎ  
HUMORISTISK KURDISK TIDNING  
JOURNAL HUMORISTIQUE KURDE

ANSVARIG UTGIVARE  
OCH REDAKTÖR

ADRESS

BUHAYÊ WÊ / PRIS

: MAMOSTE  
: c/o Gezgin, Axbyplan 5, 163 73 SPÅNGA  
TFN: 08/760 81 23 POSTGIRO: 496 03 75-6  
: 10 Skr, 10 Ff, 3 DM. PRENUMERATION 70 Skr  
ISSN: 0283-099X